Roja penaberan a navnetewî

# XWEPÊŞANDAN
# LI HEMBERÎ NIJADPERESTÎ, MÊTINGERIYÊ
# ÊRÎŞKIN SER KELEHA EWROPA

Platforma ``Antirassistische Netzwerk`` ji bo roja navnetewî ya penaberan, di roja 20ê Hezîrana 2009an de, li Zurichê em bigihêjin hev. Ji bo piştgiriya bi koçber û penaberan re li hemberî kiryarên dijmirovî em xwe şanî keleha Ewropa bidin.

Li gorî Komîsertiya Bilind a Penaberan a Netewên Yekbûyî (UNHCR) 67 milyon mirov pêwîstî jiyîna penabertiyê hatine kirin. Ji sedî 90ê van penaberan derbasî bajarên din ê welatê xwe yanî derveyî welêt bûne. Ji vana tenê beşekê rêka Ewropa girtine. Ewropa deriyên xwe yên Başûr û Rojhilat girtine. Ewropa hemû deriyên xwe bi kelehên asê, têlên bi sitirî, kamera û teknolojiya dawîn hilgirtiye parastinê. Ev ji bo mirov û penaberan tê wateya rêyek dirêjtir û xetartir. Ev şereek li ber deriyên Ewropayê ye. Di vî şerî de keştiyên şer, helîkopterên leşkerî, teknolojiya dawîn û tîmên taybetî ên hatine perwerdekirin li hemberî penaderên tije keştiyan bûne radiwestin. Ev jî bê guman her sal dibe sedema mirina bi hezarê penaberan. Behra Spî ji demeke dirêj ve bûye goristana komkujiyê di deh salên dawî de, tenê li Îtalyayê zêdeyî deh hezarî penaber jiyana xwe jidest dan. Û Swîsreya ``mirovhez`` û Ewropa ya dilketyê xwe; ew zêdetir pere vediqetînin ku tixûbên xwe asê bikin, derbaskirina wê zahmetir û mirindar bikin..bi sazûmanên zordest re hevkariyê dikin û pêlî mafê mirovan dikin. Yekî bikaribe were Ewropayê jî li ber bayê sar radiwestînin. Nijadperestiya bi dizî û ya eşkere, mêtin, karkirina nanêzikê, xistina zindanê ê kesên mafê rûniştinê bi wan re nîn e, kontrola li ser jiyana civakî û hemû şopandin tev tenê parçeyên rastiyê ne û mirov bi vana re rû bi rû dimînin.

Împaratoriya Romayê ji welatên dûr kole, madenên giranbuha û xwarinên bingehîn ên jiyanê derbasî Ewropayê kir. Heta îroj ev wiha domiya, nehat guhertin. Dewlemendiya me, li ser mêtina welatên feqîr li pêş dikeve. Kesên mêtinger û yên girêdayî bi sedê salan e şopên kûr hiştin. Swîsre û Ewropa divê berpirsyariya vê ya dîrokî bi cih bînin. Rehetiya me hebûna bingehîn a kesên din aciz dike. Dibêjin ji bo tiştan û alavêntiştçêker bi xêrê hatin, lê bila mirov derkevin biçin. Berya sed salan li Swîsreyê jî birçîbûn, feqîrtî û tinebûn hebû. Ji ber vê mirova koç kirin. Îroj em demeke nû ya cuda dijîn; Swîsre yek ji welatên herî dewlemend ê cîhanê ye. Swîsre îroj ji bo Ewropa deriyê xwe li penaberan bigre, pêşengtiyê dike, zagonên nû û rêzikên nû derdixîne.

Hebûn û dewlemendiya me ya îroj, li ser feqîrtiya welatên din li pêş ketiye. Yekîtiya Ewropa ji bo vê dewlemendiyê biparêze kelehên nediyar lê dike. Berdêla vê jî her sal mirina bi hezaran mirov e. Hemû Ewropa ji vê yekê dilxweşiyê dibihîse, gelê wê jî bi gelemperî destekê dide û jê re li çepikan dide yan jî bi gotina min nedît, nebihîst, nizanim xwe li kerr û laliyê datîne. Ji bo vê em li hemberî nijadperestî mêtingerî û zordariyê ne. Ji ber ku em dîroka xwe ya derbasbûyî dizanin, divê em tiştekî bikin. Em li hemberî vê bê deng nemînin, em vê yekê erê nekin.!!

## 20 Hezîran 2009 Şemî Saet 13.30
## Landesmuseum li kêleka Bahnhofa Zurichê

**Antirassistisches Netzwerk**, **augenauf**, **Bleiberecht für alle**, **Colectivo sin papeles**, **DFEZ** (Darfur Friedens- und Entwicklungszentrum), **DVF** (Demokratische Vereinigung der Flüchtlinge), **IDHF** (Föderation für demokratische Rechte in der Schweiz) **Flüchtlingscafé Refugees Welcome**, **Haraga**, **Infoladen Kasama**, **IFIR** (International Federation of Iraqi Refugees), **IUR** (Iranian Union of Refugees), **Karakök Autonome Turkei/Schweiz**, **OWFI** (Organization of Women's Freedom of Iraq), **PdAZ** (Partei der Arbeit Zürich), **Six Campers**, **SPI** (Socialist Party of Iran) und **TÖP** (Gesellschaftliche Freiheitsplattform Türkei/Schweiz)